

Di siyaseta hundirîn de, paşveçûn!

Rozad Elî

Ji havîna borî de, pirseke li ser zimanên xelkê Sûryê digere, nemaze jî li ba mirovê Kurd pirs wiha ye: Çima helwesta dewletê li ser hêz û kesên ku di warên demokratîk û rêzanî de dixebitin sertir bûye, bi taybetî jî di tenga gelê Kurd re?

Bi rastî jî, gava mirov şirîta bûyer û çalakiyên hêzên demoqrat li Sûryê, yên Kurd jî di nav de, di ber çavan re derbas dike, ew tiştine nû ku ji salên berê cidawaztir û bêtir nabîne. Li bervajî wê, li salên berê gelek çalakî û lebatên siyasî û civakî yên giring, bi şeweyekî êşkere ji hêla rikberên destlatê ve wek çalakiyên navendên rewşenbîrî, şevên rêzanî li gelek bajarên Sûriyê, û h.w.d dihatin kirin. Li wan deman, sazûmanzê û dezgehên xwe yên asayîşî, pir caran çavên xwe li ser çalakiyên ku li dervayî vîna wan dibûn dadimrandin, û ta radeke bilind guvaştina xwe li derbarê azadiya welatiyan jî sist kiribû, û ango destlat dilxwaz bû ku rûyekî rind raberî gelê Sûrî û bêtir jî raberî raya giştî ya cîhanî bike.

Lê gelo..! Çima destlatê li wê demê ew helwest digirt û niha jî wekî ku ew li xwe poşman bûye û dike dîsa bide saz û siyasîyên xwe yên hundurîn yên berê?

Mirov dibîne, ku piştî gurûpa destlatdar sozên xwe di guhertin û nûjenkirinê de bi cih nînin, bêhna genîbûnê jî ji her war û movikên dewletê hilkelî û rewşa aborî û jiyanewerî jî her diçe kaviltir dibe. Gurûpa destlatdar baş hestwar bû ku baweriya hemî nofên gel ji dest çû, nemaze jî baweriya tevger û saziyên ku doza guhertin û demokrasiyê dikin. Li ber roniya van rastiyan, gurûpa destlatdar pêkol dike, ku bi her hawakî li ser textê destlatê bimîne. Loma jî ew hewl dide ku tevgera

demokratîk ku berê ji hêla destlatê ve dorpêçkirî ye, hîn dorpêçkirîtir û bêçaretir bike, û rola wê di warên xebatên paşerojê de lawaztir bike. Lewre jî ew kar dike, ku çî derfet û kirde li hundurê welêt û li derve jî hebin bi dest xîne û ji bo xortikirina xwe bikar wine. Ji wan karên ku ji bo bicihanîna wê armancê pêwîst û giring in, yek jê lawazkirin tevgera demokratîk e, û yek din jî tirsandin û eşandina hemî welatiyan e.

Di meydana binpêkirina azadî û berjewndiyên welatiyan de bê bend bibe, û bi hişkî li hember çalakiyên siyasî û civakî jî radiwest e.

Bi rastî jî, li dema ku îdara Emerîkî ya berê hebû, dihat dîtin ku çawa gurûpa destlatdar razîbûna welatiyên Sûrî dixwast, û benê azadiyê jî piçekî sist kiribû. Lê piştî ku bahoza wê îdarê derbas bû, destlatê da hawê xwe yê berê û dîsa benê azadiyan kin kir û destê xwe li stuyê welatiyên Sûriyê guvaşt. Em vê yekê ji ba xwe nabêjin, destlat bi xwe û bi şeweyekî zelal û êşkere dibêje, ku va ye C.Boş çû û em man, û bila tev zanibin ku em niha ji berê bi hêztir in!?

Bi rastî jî, tiştêkî hîç ne normal û xwezayî ye û cihê şerm û mixabiniyeke giran e jî, ku destlatak helwest û siyasetên xwe li derbarê gelê xwe, li gor têkliyên xwe bi filan dewletê re, yan bi hebûn û nebûna serokê bêvan dewletê re bajo . Ev reng ji birêvebirina destlatê, di siyasîyê de radeya herî keysebaz e.

Belê, rastî jî ev e, ji ber ku destlat destlata me ye, em berê wê nas dikin, û em dizanin jî ku çiqasî rêberên Partiya Be's di wan waran de pispor, xwedî taqe û behrek in.

Ev siyaseta wan penda Kurdî ya ku dibêje: ((Gur 'eyarê xwe navêje)), bi cih tîne, û mêlag jî dike ku ew pend di siyasîyê de jî rast e!!